



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 29

Ramana Ayînî Sûmerî

Peywendiya navbera siyasî û ayînê:

Bi awayekî giştî ramana ayînî û siyasî ya her gelekî du rûyên yek rastiyê ne. Hawîrdora gel çanda wî pêktîne û di çarçewa çanda wî da bîreweriya wî ya siyasî û ayînî pêktê. Da ku em ramana ayînî ya her gelekî baş fêhbikin, divêt di pêşî da em ramana wî ya siyasî nasbikin. Tiştê ku vê yekê piştrast dike ewe ku oldar di destpêka mîtolojiyê da desthilatdar bû jî. Di dema pêximberan da jî rewş wisa bû; pêximberan desthilatdariya ayînî û siyasî di dest xwe da digirt.

Dema ku ramana siyasî li ser bîngeheka demokratî (hevbeş) bê avakirin, hîngê ramana ayînî jî dibe hevbeş; yanê beşdariya kesên din jî di girtina biryaran da heye. Ji hêla din va, ramana siyasî ya zordar ku dayîna biryarê dixê destê desthilatdarekî zordar (dîktator / dêspot) li gor wê ramana ayînî jî dibe yekane û biryar jî tenha bi navê xwedayekî yekane têne dayîn ku biryara hevbeş bi ti awayî napejirîne, û çarenûsa kesê ku gumanê têxe biryarên wî êdî dojehe.

Ev peywendiya navbera ramana siyasî û ayînî ne herdem qeyd û rêzikeka çespanî ye, lê bi gelemperî ew wisa raste. Rastiya wê di ramana ayînî sûmerî da baş tê diyarkirin. Dîrokzanê danîmarkî *Thorkild Jacobsen* di pirtûka xwe da "**Primitive Democracy in Ancient Mesopotamiya**" (**Demokratiya Destpêkî li Mêzopotamiya Kevin**) dibêje: Sazûmana siyasî sûmerî demokratî bû. Di wê demê da du encumen (meclîs) hebûn. Encumena Rihsipiyan (yên temenbilind, rêber) û encumena gel û jin jî di nav wan da. Ev herdu encumen ji bo standina biryarên pêwîst dicivyan. Ji bo her kesekî ji gel jî mafê axaftinê di van herdu encumenan da hebû¹.

Li hember wê, şêwazê demokratî (hevbeş) di ramana ayînî da jî serdar bû. Sûmeran bawer dikir ku endamên civata xwedawendî "**Pantheon**" hin mêr û hin jî jinin û ew hin afrînerin ku dişibihin mirovan; cudahiya wan ewe ku hêz û şiyana wan bê sînore, ew herdem zindî ne - ew nemirdin; û her xwedayek berpirsiyarê diyardeyeka gerdûnî ye (asîman, erd, derya, ba, roj, heyv, bahoz, çem, deşt, çiya, dewlet, bajar, bend, cok, zevî, hevcar û hwd.). Rola endamên **Pantheon** di wergirtina biryaran da gelek çalak bû².

Hin diyardeyên ramana ayînî sûmerî:

Pantheona xwedawendî: **Pantheona** xwedawendî sûmerî ji 3000 xwedawendan pêkdihat. Navê wê "ewpêşwawgîna" bû. Ev peyv dişibihe peyva kurdî "Ew pêşewa gîne" (yanê hemû

serwer). Helbet divêt bête zanîn ku nivîskarên ereb tîpên "p" û "g" bi awayê "b" û "k" dinivîsîn, ji ber ku tîpên "p" û "g" di erebî da tinene. Xwedawendên Sûmer yên here payebilind çarin:

1 -Nammo: Deryaya pêşîn û afrînera surîştê. Sûmeran wisa bawer kiriye ku afrînerê asîman (An) û yê zemînê jî (cî) ye.

2 - An /Anu: Xwedayê asîman, serek û bavê xwedawendane, û ew kurê Nammo ye. Taybetmendiya wî bilindahî ye. Gotina "An" bi sûmerî navê "asîman"e jî. Sûmeran wisa didîtin ku asîman wek banekî di ser wan ra ye. Di pey ra hin bi hin ev gotin bû nîşana xwedawendiyê bi giştî³.

3 - En- lil: Xwedawendê neteweyî yê Sûmeran û mezinê xwedawendên wan; ew ji yekîtiya "An" (asîman) û "Cî" (erd) pêkhatiye û, ew herdu ji hev cuda kirine. Maneya navê wî "serwerê bahozê" ye. Bi baweriya Sûmeran bahoz ji çiyayan da tê. Ji ber wê jî, bi lexem ji "En- lil" ra gotine "Kur- gal" (çiyayê mezin) û kebanîya wî "Nin- lil"e. "Nin" tê maneya "serwera jin" (bano)⁴.



(Xwedawend Enki ji Abzu - kana avê - derdikeve hişkiyê)

4 - Enki: Jêra "Angî" (Ancî) jî tê gotin; ew xwedayê aqilmendî û ava şêrîne; ew xwedayê sêhemîn di sêkoşeya xwedawendî sûmerî da ye "An - Enlil - Enki". Maneya navê wî "serwerê erdê" (serwerê zemînê) ye. Navê wî yê kevin "Abzû" bû. Ew xweda ye, yê ku mirov hînî nivîsandin, huner û duristkirina tiştan kirine. Wî jiyana li ser zemînê li gor biryarên ku di civata xwedawendî da bi rêveberiya "Enlil" dihatin wergirtin, birêdixist. Navê kebanîya wî "Nin- gi" ye; yanê (serwera zemînê)⁵.

Afirandina mirovan: Sûmeran gotûbêja here hevin derbarê afirandina mirovan gotine. Kurtahiya vê gotûbêjê ewe ku di destpêkê da xwedawend du beş bûn. Xwedawendên "Anunnaku", ewên ku serdariya civata xwedawendî dikin; peywîrên wan serwerî ne; û xwedawendên "Igigi" (Îcîcî), ewên ku bi kar û barên zehmet û giran radibûn. Van xwedawendan bi ked û cefa ev karên giran bi dirêjahiya sê hezar û şesed sal berdewam kirin. Di pey ra, ew li dijî vîna mezinê xwedawendan "Enlil" derketin. Wan qeyd û bendên xwe çirandin, çek rakirin û di tariya şevê da êriş anîn cihê ku "Enlil" têda xewdikir (razabû). Enlil mezinên xwedawendan civandin daku pend û şêwrê ji wan wergire.



(Sûmerî nimêj dikin)

Piştî ku *Enlil* sedema serhildana "*Igigi*" (Îcîcî)-yan fêhmkir, ji xwedawend "*Ninto*" tika (rica) kir ku mirovan biafirîne, daku ew li cihê xwedwenda bi van karên giran rabin. Xwedawend "*Enki*" heriya ji axê bi xwîna goriyekî ciwan ra bi navê "*Kenco*" tevlihev kir. Peyva "*Kenco*" peyva "*genc*" bi kurdî tîne bîra me. Xwedawend "*Ninto*" ji wê heriyê 14 lib (14 perçe) birin. Di pey ra xwedayê sihirbazî û remildariyê bi pêyên xwe di ser libên heriyê ra çû û hat û "*Ninto*" dua û durûzên afrînerî dixwandin. Heft lib ji wan danîn aliyê rastê û heft libên din danîn aliyê çepê. Ji wan çardeh mirov hatin afirandin. Heft mêr bûn û heft jî jin bûn⁶.



(cudakirina nêr û mê)

Gotûbêja Tofanê: Hezar û dused sal di ser afirandina mirovan ra derbas bûn. Mirov gelek pir bûn û ji ber qîreqîr û qîjeqîja wan xwedawenda nikarîbûn êdî xewbikin (razên).

Xwedawendan biryar da ku hejmara mirovan kêr bikin. Rabûn nexweşî û pirik li wan barandin. Lê belê, tevî wê jî hejmara mirov pir bû. Rabûn baran ji ser wan birîn û xela li wan barandin, lê dîsa jî hejmara mirov hên bilind bû. Axir, *Enlil* biryar da ku wan bi *Tofanê* biwestîne û piraniya wan têkbibe⁷.

Xwedawend "*Enki*" di civîna xwedawendan da beşdar bû, wî nûçeya *Tofanê* bi awayekî ne yekser gihande mirovekî aqilmend û xwedahez bi navê "*Ziusudra*", pend û nesîhet lêkir ku ew keştiyekê durist bike, hemû hebûn û malbata xwe têxe wê daku ji *Tofanê* rizgar bibin. Rabû "*Ziusudra*" keştiyek ji heft qatan di heft rojan da durist kir. Hemû hebûna xwe ji zêr û hemû malbata xwe û xizimên xwe û her wisa hin texlîtên ji jîndaran jî xistin keştiyê û deriyê wê kîp girt. Bi vî awayî ew û yên pêra ji *Tofanê* rizgar bûn. Keştiya wan li ser çiyayê "*Nisîr*" li başûrê Kurdistanê rawestiya ku niha ji wî çiyayî ra "*Pîre Magrun*" dibêjin⁸.

Cîhana din: Sûmeran bi hebûna cîhaneka din piştî mirinê bawer dikir û nav lêkiribûn "*Kur*", yanê (cîhana jêrîn). Û navê "*Edin*" jî jêra digotin. Ev jî peyva kurdî "*ê din*" tîne bîra me, yanê "*a din*" (jiyana din). Herwisa navê "*Kur - nu - giy-a*" jî jêra digotin, yanê welatê "ne vegeerê". Sûmeran wisa bawer dikir ku giyanê mirov dadikeve wir û heya bi ebed li wir dimîne. Wan bawer dikir ku ew der cihekî xemgîn û tarî ye. Di ayîna wan da tiştekî wek bihuşt û dogehê piştî mirinê tinebû. Bala xwe didan miriyan û hin tişt, xwarin û vexwarin pêra dixistin gorê daku piştî vegeera giyan bi kêr wî bê⁹.

Perestgeha sûmerî: Sûmeran bi dilxwazî ji xwedayên xwe ra nimêj dikirin. Wan bawer dikir ku Xwedayên wan li çiyayê dijîn. Ji lew ra, ji bo wan perestgehên di dirûvên çiyayê da avadikirin. Navê perestgehê "*Ziggurat*" bû. Ev tê maneya (bilind avadike). Di pey ra *Akkadiyan* jêra "*Ziquratu*" gotine. Şêwazê "*Ziggurat*" peyva çiyayê "*Zagros*" tîne bîra me. Tîpa "s" ya dawiyê ji vê peyvê ji zimanê yûnanî li ser hatiye zêdekirin, yanê di bingehe da peyv bi şêwazê "*Zagro*" ye. Di pileya pêşîn da perestgehên Sûmeran ji sê qatan pêkdihatin û pêlekanên li teniştê wê pêra hildikişiyay jor. Li ser qatê jorîn koşkeka biçûk hebû jêra bi sûmerî digotin "*Gigunu*", di wir da peykerê xweda dihate danîn¹⁰.



(Ziggurata sûmerî)

Niha tenha ma ku em bandora ramana ayînî sûmerî li ayînên rojavayê Asiyayê nasbikin.

Evê mijara xelesa me ya dahatî be....

Çarşemb, 07.10.2015

Jêder

- ¹ Amer Suleyman, Ehmed malik El Fityan: Hin semîner di dîroka kevin da, rûpel 84.
- ² Muhemed Beyyûmî Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 100.
- ³ Geofry Barnder: Baweriyên ayîni li ba gelan, rûpel 36. Seyid Mehmod El Qimni: Gotûbêja afirandinê, rûpel 25.
- ⁴ Sabatino Moscati: Şaristaniyên Samiyan yên kevin: rûpel 253, nîşe 21. Samuel Kreimer: Ji Tabloyên Sûmer, rûpel 180-182. Wedi' Başur: Sûmer û Akkad, rûpel 183.
- ⁵ Samuel Kreimer: Ji Tabloyên Sûmer, rûpel 178. Ebdulhemid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 144-145. Seyid Mehmod El Qimni: Gotûbêja afirandinê, rûpel 30.
- ⁶ Se'id El Xanimi: Destana afirandin û Tofanê, rûpel 12, 17, 18. Seyid Mehmod El Qimni: Gotûbêja afirandinê, rûpel 26-27. Komek ji nivîskaran: Dîwana Efsaneyan, rûpel 317.
- ⁷ Samuel Kreimer: Ji Tabloyên Sûmer, rûpel 161. Se'id El Xanimi: Destana afirandin û Tofanê, rûpel 12-13.
- ⁸ Fadil Ebdulwahed Eli: Tofan di jêderên asîmanî da, rûpel 64. Se'id El Xanimi: Destana afirandin û Tofanê, rûpel 13-14, 133-137, 144, 145.
- ⁹ Fadil Ebdulwahed Eli: Ji Sûmer ta bi Tewratê, rûpel 268. Seyid Mehmod El Qimni: Gotûbêja afirandinê, rûpel 54, 89.
- ¹⁰ George Roux: Îraqa Kevin, rûpel 227. Hary Sager: Mezinahiya Aşûr, rûpel 306. Geofry Barnder: Baweriyên ayîni li ba gelan, rûpel 33. Fadil Ebdulwahed Eli: Ji Sûmer ta bi Tewratê, rûpel 82, 83, 85.